Kurdish

Tebax 2007

Nûçeyên Hackney Homes

Tevlêbûne nişteciîh **diguhere**

Hackney Homes awayê ku nişteciîh dikanin tev lê bibin diguherîne. Em vê yekê dikin ku tevlêbûna bêtir nişteciîhan teşwîk bikin, ji bo kirina vê bêtir rêyên guhertî pêşkêş bikin û hejmara civînên ku divê nişteciîh tev lê bibin kêm bikin.

Guhertin ji alîyê Desteya Rêvebir a Hackney Homes û Şaredarîyê hatine belêkirin û nuha tên bicîhkirin.

Yek ji guhertinên herî mezin ew e ku Komelên Kirêdar û Nişteciîhan (KKN) ê roleke pêşdetir hebe. Gelek nişteciîhan ji me re got ku Komîteyên Sîteyan yekcar burokratîk bûn û nedikanîn kar bidawî bianîna; lewra ev dewra civînên Komîteyên Sîteyan ê dawî be û KKN ê ji Îlonê û pey ve roleke zêdetir bilîze.

KKN ê salê çar caran li gel birêvebirê sîteya xwe û endamê encumana herêmî bicivin. Ev civîn ê vekirî bin ku hemû nişteciîh bikanibin tev lê bibin. KKN ê bikanibin xwe bigihînin budçeyên herêmî ku li çêtirkirinên sîteyê serf bikin. Hackney Homes jî dest bi sîstemeke nuh dike ku hemû mijarên ku di civînên KKN de tên gotûbêjkirin qeyd bike û wan bişopîne, da ku bicîh bike ku zû bi mijaran mijûl dibin. Heke hun qet tev li civîneke KKN nebûbin, nuha demeke baş a ceribandinê ye. Heke fikareke we hebe, ew ê pê mijûl bibin.

Panelên taxan ku nuha li mijarên berfirehîya taxan dinêrin dê karên xwe bidomînin. Lê belê di guhertinên din de, civînên bi Konvensîyona Kirêdar û Nişteciîhan re dê cîhê xwe bidin Komeke Têkilîyên Nişteciîh.

Ev kom ji nişteciîhên sereke yên ji Panelên Taxan, Foruma Xwedî-Lease'an, komên din ên nişteciîhan, Endamê Kabîneyê yê Bixanîkirinê, endamên Desteya Rêvebir a Hackney Homes û Karmendên bilind ên Hackney Homes pêk tê. Ev kom ê çavdêrîya performans û mijarên polîtîkaya Hackney Homes bike û wan şîrove bike. Awayê pêmijûlbûna mijarên ku nişteciîh tînin rojevê jî di nav vê de ye.

Em ê her weha di mehên bê de rêzeyek derfetên nuh ên tevlêbûnê jî pêk bînin ku çalakîyên nuha temam bikin; rojên kêfê, kirîna nehênî, komên fokusê û panela xwendevan di nav de ne.

Tîma me ya karmendên tevlêbûna nişteciîh ê nuha bêtir dem hebe ku li sîteyan yekser bi nişteciîhan re xebatê bikin, projeyên herêmî pêşde bixin, bêtir li fonan bigerin û alîkarîya perwerda kar û bernameyên din bikin. Hun ê li taxa xwe wan bêtir bibînin.

Hun ê li beşa Tev lê bibe ya websîteyê bêtir agahî bibînin www.hackneyhomes.org.uk an jî hun dikanin telefonî tîma Tevlêbûna Nişteciîh bikin: 020 8356 7845.

Nûçe bi Kurtî

Tev lê bibin

Ji Tebaxê û pey ve rêzeyek Forum tên lidarxistin ku nişteciîhên me ji bo şûnve agahî dayin û nêrînan teşwîk bikin.

Em dixwazin tevlêbûna civakên pircûre yên Hackney teşwîk bikin. Bi taybetî nişteciîhên ji komên Afrîkî, Tirk, Somalî û hindkahîyên din, ji wan tê xwestin ku tev lê bibin û tecrubeyên xwe yên li ser Hackney Homes parve bikin û derfet hebe ku bandorê li projeyên pêşedemê bike.

Heke hun dixwazin tev lê bibin, ji kerema xwe bi Karmendê Şêwirdarîyê yê Hackney Homes re têkilî çêbikin:

li 020 8356 2066 an email bo tracey.dunn@hackneyhomes.org.uk an jî hun dikanin biçin www.hackneyhomes.org.uk

Li ser Înternetê agahîya nûjen bistînin

Heke hun dixwazin li ser her tiştekî Hackney Homes agahîya nûjen bisitînin, xwe qeyd bikin ku Bultena Serok Birêvebir a duheftane bisitînin.

Emailekê ji vir re bişînin ku eleqa xwe raber bikin:
housingeditor@hackneyhomes.org.uk

Cîhê vala veguherî bû cîhê hêşîn

Cîhekî bikarnehatî li Pitfield Estate li Shoreditch ji bo cîhekî hêşîn hat veguherandin ku niştecîh bi rêzeyek fêkî û sewze, hêşînahî û kulîlkan mijûl in.

Projeya 'Cîhê Vala' ji alîyên projeyên 'Lê-heke' yên Hackney û Shoreditch Trust ve hatiye destpêkirin di nav niştecîhan de popular bûye û ji bo jîyana nav bajêr nêzîkbûneke bêtir hêşîn teşwîk dike. Bexçe yê di dema Festîvala Horeditch a 4-18 Tebaxê de ji gel re vekirî be.

Agahîya Nûjen li ser Lêkolîna Tamîran

Di Nîsan û Gulanê de me li ser polîtîka me ya tamîran nêrînên we pirsîbûn.

Guhertinên ji bo polîtîka tamîran pêşniyarkirî kêmkirina berfirehîya tamîrên ku nuha berpirsiyarîya kirêdaran in û zêdekirina tamîrên ku Hackney Homes dike dihundirîne. Em her weha hewl didin ku dankirina tamîran ji bo niştecîhên rewşa wan xesas û pere sitendina ji niştecîhan jî hsan dikin, ji bo tamîrên ku berpirsiyarîya wan in, ji ber îhmal an zerara qesdî pêk hatine.

Sipas ji bo hemû niştecîhên ku dem veqetandin ku nêrînên xwe yên li ser guhertinên pêşniyarkirî bibêjin. Desteya birêvebir a Hackney Homes ê di Îlonê de li ser polîtîkayeke nuh bifikire.

Li ser vê hejmara Nûçenameya Hackney Homes şîroveyên we hene? Nûçe an ramanên çîrokan ku hun dixwazin ji me re bibêjin? Ji kerema xwe bi tîma komunîkasyonan a Hackney Homes re têkilî çêbikin li 020 8356 3528 an jî email bo housingeditor@hackneyhomes.org.uk

Bar kirin: Bijartekên min çi ne?

Bi hewes in ku bar bikin nêzîkî malbat û hevalan? Haya we ji teşwîkên pere û raxistinê ji bo barkirina bo milkekî piçûktir ê li gora pêwîstîyên we heye?

Heke we ji bo yek ji pirsên jorîn gotibe erê û hun bi hewes bin ku xanî biguherînin, dibe ku haya we ji projeyên vê nêzîkê guherandî yên Tevgerîna Xanî an 'Bar kirin'a li Hackney tunebe.

Projeya Pereyê Teşwîka Kêm Dagirkirinê
Heke endamên malbata we ji xênî bar kiribin û xanîyê we ji bo we zêde mezin be û hun yekî piçûktir ê asta nizmtir dixwazin, dibe ku ev proje ji bo we be. Li gora vê projeyê, ji bo kirêdarên Hackney Homes ku serî lê didin ku bar bikin bo milkekî şaredarîyê an komela xanîyan ku hejmara odeyên xewê ji yên xanîyê wan ê nuha kêmtir be, teşwîkên pere û raxistinê tên pêşniyar kirin.

Ji bo bêtir agahîya li ser vê projeyê, ji kerema xwe telefon bikin bo Tîma Tevgerîna Xanî li 020 8356 5769/5752/5765.

Projeyê Hilbijêre û Bar bike
Hun kirêdarekî şaredarîyê ne ku li milkekî şaredarîyê yê zêde qerebalix dimînin û li lîsta payin/transferê ya şaredarîyê qeydkirî ne? Heke wisa be, ev proje bijartekekê dide we ku hun bar bikin bo milkekî kirêkirî yê sektora taybet ku pêwîstîyên malbata we bêtir bersîv bike. Li gora vê projeyê, li gel alîkarî û şêwirdarîya karmendekî dilsoz ê Tevgerîna Xanî dê teşwîkeke peran a heta bi £6000an bê pêşkêşkirin.

Ji bo bêtir agahîyê, ji kerema xwe telefon bikin
020 8356 5823/2978.

Projeya Destpêka Teze
Heke hun li guhertineke gişтî digerin, ev proje dikane alîkarîya we bike ku hun an li bixanîkirina sosyal an jî li cîhekî kirêkirî yê taybet li dervê Londonê 'destpêkeke teze' pêk bînin.

Ji bo bêtir agahîyê, ji kerema xwe telefon bikin
020 8356 5751.

Heke yek ji bijartekên jorîn bala we dikişîne, telefon bikin bo Tîma Tevgerîna Xanî li 020 8356 5760 û barkirina mala xwe îro bidin destpêkirin.

"Hackney li Londonê navçeya duyemîn a herî qerebalix e, ji lew re projeya 'Hilbijêre û Bar bike' armanc dike ku serî bi lîstaya payinê ya ji bo xanîyên şaredarîyê yên li gora malbatan ku her diçe dirêj dibe derxîne ," Sarah Gallachera Birêvebira Tevgerîna Xanî ya Hackney wisa digot.

Ji bo Hackney ramaneke we ya jîrek heye?

Bernameyeke grantên civakî ya nuh a £750,000an meha çûyî ji alîyê Tîma Hackney û Tora Bicîhkirinê ya Civaka Hackney ve hat destpêkirin. Komên ne ji bo karê, dilxwaz û civakan dikanin her yek wek perçeyekî înîsîyatîveke nuh serî li heta bi £50,000an bidin.
Grant çêtirkirina awayên ku sektora dilxwaz û civakî (SDC) a navçeyê bikanibin ji bo her kesekî ku li Hackney rûdinin jîyanê çêtir bikin armanc dike.

Sê cûre fon hene ku dikanin serî lê bidin:

- Projeyên şopandina bi lez: Heta £1,000an. Roja dawî: 12 Îlon 07
- Grantên piçûk: Ji £1,000 heta £5,000an. Roja dawî: 12 Cotmeh 07
- Grantên mezin: Heta £50,000an. Serîlêdan heta dawîya 2007an dibin.

Ji bo bêtir agahîya li ser krîterên projeyê û ku çawa serî lê bidin, ji kerema xwe bi Şaredarîya Hackney ji bo Xizmeta Dilxwaz re li 020 7923 1962 têkilî çêbikin, an jî biçin www.hcvs.org.uk/en/pages/funding-grants.aspx

Sertayên **vê havînê ewle** hiştina we û mala we

Li gel ku gelek ji me betlaneyeke havînî plan dikin, Hackney Homes û Polîsê Navçeya Hackney tînin bîra nişteciîhan ku çend karên sivik dê bibin alîkar ku xanî ji çavên şopajo yên dizên malan azad bimînin.

Derîyên kêlekê, paceyên ku bikanibin xwe bigihînînê ku vekirî bimînin û dirêncek li derve bên hiştin gişt ketina milkekî hêsantir dikin û dizekî muhtemel teşwîk dikin ku careke din lê binêre.

Hinek sertayên hêsan ku hewesa dizekî bişikînin ev in:

- Tucarî mifteyeke zêde li ber derî li derekê veneşêrin - diz hemû cîhên veşartinê dizanin
- Tucarî nav û navnîşanan li miftên xanîyê xwe nenivîsin, dibe ku hun wan wenda bikin û têkevin destên xerab.
- Tiştên bi nirx ji pacan û çavan dûr bihêlin.

Sertayeke baş jî ew e ku vê havînê dema ku hun ne li malê bin wisa bidin xuyakirin ku hinek kes li milkê we dimînin. Hun dikanin vê yekê bi van awayan bikin:

- Demjimêran bicîh bikin ku lampe û radyoyan otomatîk vekin û bigirin;
- Ji cîran an hevalekî bixwazin ku biçin û qutîka nameyan û ber derî paqij bikin; û
- Perdan bikişînin, hinek lampe vêxistî û radyoyekê vekirî bihêlin.

Ji bîr nekin

Gelek sîteyên Hackney Homes hîn jî wek perçeyekî bernameya çêtirkirinê ya Malên Minasib dorbendên çikandî hene.

Cîhên avakarîyê dikanin carinan ji bo zarokan dilkêş bin, lewra ji kerema xwe bi awayên jêrîn bibin alîkar ku qeza çênebin:

- Zarokên xwe ji herêmên kar dûr bihêlin.
- Tucarî nehêlin ku zarok hilkişin ser dorbendan an jî li bin wan bilîzin.
- Heke zarok bikanibin ji hundirê mala we xwe bigihînin dorbendê, derî û paceyên ku vê derfetê didin, kilîtkirî bihêlin.
- Nehêlin ku zarok bi materyal an alavên avakaran bilîzin an jî hilkişîin ser wesitên avakaran.
- Dema ku avakar li mala we dixebitin, zarokên bin 16 salî bi tenê bernedin.

Alarmên dûmanê yên bêpere ji bo hemû nişteciîhan

Ji hemû nişteciîhên Hackney re ji bo lênêrîna ewlekarîya agir li malên wan serdaneke bêpere tê pêşniyarkirin. Tîma Agirkujîyê ya Londonê dê her weha heke pêwîstî hebe, alarmên dûmanê yên bêpere jî pêxinê.

Piranîya agirên li malan qeza ne û dibe ku li metbexê dest pê bikin. Van e hin gavên hêsan ku li mala we ewlekarîya agir çêtir bike.

Firna vekirî bi tenê nehêlin. Dema ku karê we pê qedîya, wê vemirînin.

- Dema ku hun rûn bikar tînin, bêtir baldar bin. Gelek birîndarî ji ber agirên ji tawên kartolên hûrkirî tên, dema ku rûn yekcar germ be an jî di tawê de zêde rûn hebe.
- Cixareke vêxistî tucarî li dû xwe nehêlin û xwelîdankeke minasib bikar bînin.
- Alarmeke dûmanê bicîh bikin û wê her hefte test bikin - Heke agirek dest pê bike, alarmeke dûmanê ya ku dixebite dê demeke bi nirx bide we ku hun bikanibin biçin derve. Bi rêzdarî sehkirina ku alarma dûmanê û pîl dixebite an na dikane jîyana we biparêze.
- Rêyeke revê plan bikin û bila her kes wê bizanibe.

Ji bo sazkirina serdana agir a bêpere ji bo we, bi Tîma Agirkujîyê ya Londonê re têkilî çêbikin: 0800 028 4428 an jî smokealarms@london-fire.gov.uk.

Heke dijwarîya we ya bihîstinê hebe, balîfeke hejînok an jî ronahîyeke flaş peyde dibe, an jî hun dikanin yekê bêpere ji Royal National Institute bikirin: 020 7296 8000.

Her tim bibîr bînin, heke agirek dest pê bike - derkevin derve, li derve bimînin û telefonî 999 bikin - bi xwe şerê agir nekin.

Hackney

Pev re xebat ji bo nişteclhên Homerton nûçeyeke baş e

Xebata hevparîya bi bandor ji bo nişteclhên Homerton xwe gîhandina xizmetan û pêkanîna çêtirkirinên berbiçav li taxê hêsantir dike.

Li 'berê Hackney'ekê, Ofîsa Taxa Homerton ji bo Hackney Homes, Polîsê Homerton û Projeya Azibên Bêxanî (sazîyeke ku piştevanîyê ji bo kirêdarên Hackney pêşkêş dike) komeke xizmetên berfireh pêþkêþ dike.

David Saxonê Birêvebirê Ofîsa Taxê got ku her roj li bin banekî ji nêzîk de pev re xebitîn tê wateya pêşkêşkirina xizmet û encamên çêtir ji bo nişteclhên herêmê.

"Li gel karmendên polis ku nuha li nik karmendên me yên şêlên antîsosyal cîh disitînin, em dikanin bêtir bi bandor hevkarîyê bikin û fikarên mişterî zûtir çareser bikin. Bi taybetî, komunîkasyon her rim bi lez tên kirin ku ji bo raporkirin û pêşîgirtina nerehetî û şêlên acizker ên li sîteyên me yekcar girîng in," David digot.

Têkildarî û tevlêbûna nişteclh bi rêya Panela Taxê ya Homerton jî hatiye xurtkirin, ku alîkarîyê dikin ku li masa resepsîyonê karmend hebe û li ser derfetên tevlêbûnê yên ku peyde dibin şêwirdarîya nişteclhên din dikin.

Navnîşan: 92 Well Street, E9 7JA.
Telefon: 020 8356 7800

Rûpel 4 | 5

Gera delegeyên Hong Kong li taxê

Ofîsa Taxa Homerton vê nêzîkê mazûvanîya komeke delegeyên şaxê Hong Kong ê Înstitûta Bixanîkirinê kir – ew li Homerton gerandin û çûn serdana çend sîteyên Hackney Homes.

Karên çêtirkirinê yên ku li sîteyên herêmê wek parçeyekî bernameya Malên Minasib a Hikûmetê tên kirin bandor li koma ku ji Birêvebirên Bixanîkirinê û Surveyoran pêk dihat kir. Her weha fokusa Hackney û dilsozîya regenerasyonê jî bala wan kişandin.

Delege çûn serdana Granard House û Banbury House û her wiha Nûnerên Kirêdarên herêmê dîtin.

Biryara nîşana sînor kêşxaneya 50. jî da girtin

Teknolojîya ku bêtir li balafirxanan ji bo dîtina teqînekan tê bikaranîn alîkarîya Projeya Hackney kir ku bi serketinî ji bo girtina kêşxaneya 50. li navçeyê biryara girtinê bidest bixe.

Ion Track Itemiser 3 dikane hem narkotîk hem jî teqînekan bibîne û delîlên ku bi vê makînê hatin komkirin vê nêzîkê li Dadgeha Thames Magistrate hatin bikaranîn ku biryareke girtinê bê sitendin.

Wayne Hyltonê Serokê Ewlekarîya Sîteyê yê Hackney Homes di şîrovekirina biryara 50. a girtinê de wisa digot: "Em sipasdarê nişteclhên xwe ne ku hişyar in û time ji çalakîyên gumanbar ên li herêma xwe haydar dikin. Ev alîkarîya bi lez e ku rê dide komkirina delîlan û pêkanîna çalakîyeke bi lez li dijî vê şêla antîsosyal ".

Projeya Sergirtinê ya Hackney tîmên pispor ên ji Hackney Homes û polis dihundirîne û kêşxaneyên li Hackney pêk bi lez dane girtin.

Ji bo raporkirina kêşxaneyeke gumanbar nehênî û bêpere telefonî Tîma Projeya Sergirtinê bikin li 0800 073 1779, tekst 07976 911 165 an jî email crackdown@hackney.gov.uk

Nûçeyên Xwedî-Lease û Xwedî-Milkan

KONFERANS ji bo Xwedî-Lease û Xwedî-Milkên Hackney Homes

TARÎX JI BO ROJNIVÎSKA WE: 3 Mijdar 2007 10.00-16.00
The Ocean, 270 Mare Street, E8

Ev cara yekemîn e ku Hackney Homes ê Konferansake Xwedî-Lease û Xwedî-Milkan li dar bixe, îsal di 3ê Mijdarê de. Ew ê li the Ocean, 270 Mare Street (li hemberî Hackney Town Hall) seet di 10.00 - 16.00an de bê lidarxistin. Lewra ji kerema xwe li rojnivîska xwe binivîsin.

Ev çalakî yê derfeteke hêja bide we ku hun agahî û şêwirdarîya li ser hejmarek mijarên ku wek xwedî-lease an xwedî-milk we eleqedar dikin bisitînin.

Ew ê peyvdarên ji Hackney Homes û LEASE (Xizmeta Serbixwe a Hikûmetê ji bo Şêwirdarîya Xwedî-lease'an) amade bin. Di nav mijaran de dê maf û berpirsiyarî, nirxa peran û jêxweşbûna xwedî-lease jî hebin.

Dezgehên departmentên pircûre yên Hackney Homes û Şaredarîya Hackney dê amade bin ku bersîva pirsan bidin. Xizmetên Xwedî-Lease û mafê Kirînê, Malên Minasib, Lênêrîna Plankirî, Xizmeta Tamîran,

paqijî û Lênêrîna Zemînê, Tevlêbûna Nişтecîh û li gel tiştên din partnerên din jî dê di nav de bin. Sazîyên derveyî dê sazîyên xweşhalî û şêwirdarîya xwedî-lease'an bihundirînin.

Em li ser evên jêrîn semînaran plan dikin:

- Xizmetên Xwedîtîya Malê û Xwedî-Lease'an
- Birêvebirîya Milk û Avahîyan (tamîr di nav de ne)
- Birêvebirîya Karûbarên Xanî/şêlên antîsosyal
- Xizmetên nakokîyan

Bufeyek ê bê pêşkêşkirin. Em ê li gel tevlêbûna Xwedî-lease'an ji Foruma Xwedî-Lease û Xwedî-Milkan a li seranserî navçeyê naskirî û Komela Xwedî-Lease'ên Bakurê Rojhilat konferansê birêk bixin, da ku em wê li gora pêwîstîyên we saz bikin.

Konferans ê bi rêya vexwedninê bê birêkxistin, da ku em bikanibin xwarinê, peyivînên şêwirdarîyê û semînaran li gora hejmarên naskirî saz bikin.

Ev çalakî yê bi 250 xwedî-lease û xwedî-milkan sînorkirî be, lewra heke hun dixwazin tev lê bibin, ji kerema xwe me agahdar bikin.

Ji kerema xwe forma qeydê ya pêvekirî tije bikin û di zerfa dayî de bişînin.

Wek alternatîv, hun dikanin biçin werbsîteyê, email bişînin bo **LHFHconference@hackneyhomes.org.uk** an jî telefonî **020 8356 2288** bikin ku hatina xwe qeyd bikin.

Nûçe bi Kurtî

Ji kerema xwe not bikin ku Ofîsa Wezneyê ya li Town Hall (Şaredarî) û Ofîsên Şaredarîya Stoke Newington di 3 Îlon 2007an de bar dikin bo ofîsên nuh ku li paş Christopher Addison House li 2 Hillman Street E8 in.

Bloka piçûk çêtirkirinên mezin

Nişтecîhên bloka piçûk li Lower Clapton li bloka xwe hejmarek çêtirkirin pêk tînin – û ferqeke girîng çêdibe.

Li gora Tonia Taylora nişтecîha bloka şeş-xanî, blokên piçûk ên li Hackneyê her tim bi qasî ku heq dikin bala raya giştî nakişînin ser xwe.

"Li seranserê Navçeyê gelek blokên piçûk hene û bi dîtina min, serketina me ya li bloka me dîyar dike ku blokên piçûk xwedî potansîyel in ku bibin mal û cîhên xweş ên jîyanê."

Tonia û cîranên wê seferber bûne ku derîyekî derve yê nuh pêxin, bilindîya bendan zêde bikin û korîdora holê boyax bikin. Lê belê bê guman serketina herî mezin li bexçe ye. Qadeke fireh a gîhayê rê li ber rehek û latên kulîlkan, mêrgeke xweş lênihêrtî û qadeke lîstinê ji bo zarokan vekiriye.

"Dema ku min neh sal berê bar kir, bexçe tevlihevîyek bû, li her derê gîha û qirêj hebû û qet ewlekarî tunebû ku dibû mijareke girîng."

Hackney Homes paceyên nuh û sîstemeke înterkomê a nuh ji bo zengilê derî ku ewlekarîya nişтecîh pêk bîne, bi milk xistine.

"Bi rastî jî nuha cîhekî guhertî ye. Hîn jî yek-du tiştên din hene ku em hêvî dikin ku bi Hackney Homes re çêkin, wek tesîsên çêtir ên vezîvirandinê (recycling), lê belê blokeke gelekî ewletir û bi rastî xweş e."

Hun dixwazin ji me re qala çêtirkirinên li xanî, blok an sîteya xwe bikin? Ji keremax we li **020 8356 3528** telefonî me bikin, an jî email bişînin bo **housingeditor@hackneyhomes.org.uk**

Em çawa bi gilîyê we mijûl dibin

Hackney Homes ji bo bi hezaran nişstecîhên seranserî navçeyê rêzeyeke xizmetan pêşkêş dike. Wek ku em gişt dizanin, carinan tişt dikanin neçê herin û nişstecîhên me bi kirina gilîyekî haya me jê çêdikin. Ev dihêle ku em ya xerab baş bikin, wek sazîyekê hîn bibin û ji bo pêşdemê tiştan rast bikin.

Di şeş mehên pêşî yên vê salê de, nişstecîhan forma li ser înternetê bikar anî, name şandin û telefonî tîma gilîyan kirin (kitkitên têkilîyê li jêr in), da ku ji bo hin xizmetên ku em pêşkêş dikin gilî bikin

Hinek mijarên ku îsal ji bo wan gilî hatin kirin ev in:

- Tamîrên Reaktîv
- Lênêrîna Herêmên Hevpar / Blokan
- Sûc û Şêlên Antîsosyal

Çêtirkirina kalîteya bersîvan
Di bersîvandina we de, em bicîh dikin ku bersîv:

- di nav dema minasib de be;
- rast û dirust be;
- hemû mijar/pirsên kirî bersîv bike; û
  li gora delîlan encameke mantiqî bide.

Hemû gilî ji bo me girîng in. Her yek ji bo yekser çêtirkirina xizmetên ku em pêşkêş dikin tê bikaranîn.

Lêkolîna Dosyê
Nişstecîhekê ji bo valahîya dirêncekên bloka xwe gilî kir. Wê got ku her çiqas tîma paqijîya sîteyê bi rêzdarî tê ku blokan paqij bike jî, mirov dirêncekan bi tişt mişstên dermanan û mîzê gemarî dikin. Bersîveke giştî ya nivîskî ji nişstecîhê re hat şandin û Tîma Ewlekarîya Sîteyê bi temamî çavdêrîya blokê kir. Wek encama vê yekê, hat dîtin ku blok ji bo firotina narkotîkên neqanûnî tê bikaranîn. Kesên ku dikirin hatin girtin û blok ji bo hemû nişstecîhan ewletir û paqijtir bû.

Çawa pesin bidin an gilî bikin

Telefonî me bikin: **020 8356 5022** an jî faks bişînin bo 020 8356 5091
Email bişînin bo **housing.complaints@hackneyhomes.org.uk**
Forma ser înternetê bikar bînin, li **www.hackneyhomes.org.uk**
Biçin ofîsa taxê ya herêma xwe (agahîya bi kitkit li rûpel 8 e)
Ji me re nameyekê bişînin bo: Complaints Team, Hackney Homes,
Clapton Neighbourhood Office, 136-142 Lower Clapton Road, London, E5 0QD

Performans Bi Yek Nêrînê

Kurteya Performansê

Bersîva Telefonan a Navenda Bangê ya Tamîran	**Performans - Pozîsyona îsal heta vê rojê**		
Rêjeya telefonên bersîvkirî	96.7%	Armanc 94%	**Li jorê armancê**
Rêjeya telefonên di 5 lêdanan de bersîvkirî	88.6%	Armanc 75%	**Li jorê armancê**
Gilî			
Gilîyên pêngav 1 di 15 rojan de bersîvkirî	95.1%	Armanc 75%	**Performansa mikemel**
Gilîyên pêngav 2 di 15 rojan de bersîvkirî	86.2%	Armanc 75%	**Li jorê armancê**
Paqijîya Sîteyê			
Rêjeya hemû sîteyên ku standarda wan a paqijîyê baş û qebûlbar e	88.4%	Armanc 80%	**Li jorê armancê**
Tamîr			
Rêjeya randevûyên sazkirî û bicîhhatî yên seranserî navçeyê	98.2%	Armanc 98%	**Gîhaşt armancê**
Rêjeya tamîrên acil ku di nav lîmîtên hikûmetê de hatine qedandin (seranserî navçeyê)	99.5%	Armanc 96%	**Performansa mikemel**
Rêjeya tamîrên rewşa acil ku di nav 24 seetan de hatine ewlekirin	95.0%	Armanc ê bê pêşdexistin	**Performansa baş**
Rêjeya karên yekser ku di nav 2 seetan de hatine ewlekirin	97.6%	Armanc ê bê pêşdexistin	**Performansa baş**

Tiştên ku we ji me re gotin …

Yek ji lixwegirên me yê Malên Minasib, Mulalleys vê nêzîkê hinek şûnve agahîdayinên pir erênî yên li ser karê ku ew li taxa Queensbridge û De Beauvoir dikin sitendine.

Serokê Desteya Birêvebir a Razandina Taxê, Fred Filce wisa got, “karmendên we her tim bi awayekî profesyonel û dostane baş dixebitin û kirêdaran ji min re gotine ku karên qedandî ecibandine.” Her bijî!

Têkilî bi me re

Gelek awa hene ku hun dikanin bi me re têkilîyan çêbikin …

Telefon bikin an biçin Ofîsên me yên Taxê:
Bakurê Rojhilat (Stamford Hill)
Clock House, 149 Stamford Hill,
London N16 5LG
Telefon: 020 8356 6500
Ofîsa Sîteya Nightingale,
20 Olympus Square, London E5 8PL
Telefon: 020 8356 1914

Bakurê Rojava (Stoke Newington)
Stoke Newington Municipal Offices,
Stoke Newington Church Street,
London N16 0J
Telefon: 020 8356 6100

Homerton
92 Well Street, London E9 7JA
Telefon: 020 8356 7800

De Beauvoir & Queensbridge
31 De Beauvoir Road,
London N1 5SJ
Telefon: 020 8356 6600

Shoreditch
1 Cropley Street, London N1 7PT
Telefon: 020 8356 6705
2 Whiston Road, London E2 8BW
Telefon: 020 8356 1731

Lêpirsînên xwedî lease û xwedî-milkan
298 Mare Street, London
E8 1HE
Telefon: 020 8356 2100
Email: Leaseholders@
Hackneyhomes.org.uk an jî
service.charges@
hackneyhomes.org.uk an jî
major.works@
hackneyhomes.org.uk

Tamîrekê rapor bikin
Telefon: 020 8356 3691
Email:
RepairsRCC@hackneyhomes.org.uk
Li ser Înternetê: www.hackneyhomes.
org.uk/h-housecall.htm

Pesin bidin an gilî bikin
Telefon: 020 8356 5022
Faks: 020 8356 5091
Email: housing.complaints
@hackneyhomes.org.uk
Înternet: www.hackneyhomes.
org.uk/hc-complaints.htm

Tund û tûjîya nav malê an sûcê nefretê rapor bikin
Telefon: 020 8356 4459 or
Telefona bêpere 0800 056 0905

Hejmarên din ên telefona kêrhatî

Raporkirina dengzarîyê: 020 8356 4455

Avêtîyên gir/paqijîya kuçe û kolanan: 020 8356 6688

Alîkarîya Kirêya Xanî û Baca Beledîyê: 020 8356 3399

Lêpirsînên baca beledîyê: 020 8356 3154

Tîma Tevgerînê ya Bixanîkirinê: 020 8356 5760

Lampên kuçan: 020 8356 2897

Destûrnameyên parkkirina li cadê: 020 8356 8877
(ji bo destûrnameyên parkkirina li sîteyê bi ofîsa taxa xwe re têkilî çêbikin)

Xizmeta Navbervanîyê ya Hackney: 020 8356 4794
Projeya Sergirtinê:
Telefona Bêpere 0800 073 1779